



DANEZAN & DEKLERASYON

**PARTÎYA WELATPARÊZÊN KURDISTANÊ
PARTÎYA WELATPARÊZANÊ KURDISTANÎ
KÛRDISTAN YURTSEVERLER PARTISI**

PWK

DANEZAN

PARTIYA WELATPARÊZÊN KURDISTANÊ
PARTÎYA WEKLATPARÊZANÊ KURDISTANÎ
KÛRDISTAN YURTSEVERELER PARTÎSÎ

PWK

DESTPÊK

Di destpêka gulana sala 2022an de, Tevgera Demokratîk a Kurdistanê (TDK-TEVGER) û Partîya Azadîya Kurdistanê (PAK) ji bo rêliberwekirina yekîtîyeke sîyasî û rêxistinî komîsyonek hevbeş ya dîyalogê ava kirin.

Komîsyona PAK û TEVGERê di 04.08.2022an de, li gorî rojeva ku hate tespîtîkirin, dest bi hevdîtin û xebatê kirin. Herdû alî gihastin vê encamê ku li Bakurê Kurdistanê pêwîstî bi partîyeke neteweyî, demokratîk, girseyî û legal ya berfireh û xurt heye.

Komîsyonên dîyalogê ji bona amadekirina reşnivîsa deklerasyona yekîtîyê û programa partîya nû jî ji birêveberên PAK û TEVGERê komîsyonek hevbeş ava kirin.

Reşnivîsa deklerasyon, program û raporên xebatên ku ji aliyên komîsyonên hevbeş ve hatibûn amadekirin, bi endamên PAK û TEVGERê re hatin parve kirin. Endamên PAK û TEVGERê li gel nêrîn, rexne û pêşniyarên xwe yên çêker, xebata yekîtîya sîyasî û rêxistinî pesinandin û piştgirîyeke girîng dane pêvajoya yekîtîyê.

Piştî van amadekarî û xebatên hevbeş, PAK û TEVGERê biryar dan ku divê êdî em bi kadir û kesayetîyên siyasî yên ku li Bakurê Kurdistanê pêwîstîyê bi avakirina partîyeke neteweyî, demokratîk, legal û girseyî dibînin re pêwendîyan deynin; di derheqê vê xebata ku heta îro hatîye kirin de wan bi hûrgilî agahdar bikin û vê deklerasyon û

çerçeweya siyasî ya hevbeş bi wan re parve bikin; nêrîn û pêşniyarên wan yê di vî warî de bigrin û li gorî rê û rêbazeke hevbeş, wan jî beşdarî nav vê pêvajoya yekîtîya siyasî û rêxistinî bikin.

Di encama van xebatên hevbeş de, PAK û TDK-TEVGERê biryara yekîtîyê girtin.

PAK û TDK-TEVGERê, teva kesayetîyên serbixwe di 9-10ê îlona 2023an de li Diyarbekirê kongreya xwe ya yekîtîyê pêk anîn û di 10ê îlona 2023an de, Partîya Welatparêzên Kurdistanê (PWK) hate damezrandin.

Ji bo ku PWK weke partîyeke eşkere û qanûnî xebatên xwe bimeşîne, dest bi prosedurekê kir. Li gorî vê pêvajo û perosedurê, PAKê di 17ê îlona 2023an de, li Ankarayê di çavderîya Lijneya Hilbijartinê ya Çankayayê kongreya xwe ya sêyemîn pêk anî. Di vê kongreya qanûnî de, Partîya Azadîya Kurdistanê (PAK) navê weke Partîya Welatparêzên Kurdistanê (PWK) guherand.

Partîya Welatparêzên Kurdistanê (PWK), weke partîyeke meşrû û qanûnî xebatên xwe didomîne.

Ev danezan, di 9-10 îlona 2023an de di kongreya yekîtîyê ya Diyarbekirê de hatiye qebûlkin.

ÇERÇWEYA SIYASÎ YA PARTÎYA ME

Pênaseya miletê kurd û Kurdistanê

Miletê kurd yek ji kevintirîn miletên Rojhelata Navîn û mîratxurê şaristanîya Mezopotamyayê û Rojhilata Nêzîk e. Ango; ew ne miletêkî çêkirî ye û xaka tu kesî jî dagîr nekirîye. Ew ne bi zorê hatîye afirandin û ne jî li ser înkâr û tunekirina milet û pêkhatayên cuda hatîye hûnandin. Ew bi zimanê xwe, bi tarîx û îstiqrara civata xwe, bi kultur û toreya xwe û bi erdnîgarîya xwe miletêkî xwezayî û dîrokî ye. Di pêvajoya dîrokê de, wî xaka xwe ya nîştimanî bi tevaya pêkhatayên etnîkî, dînî, mezhebî û bawerîyan ve parve kirîye. Bi hezaran sal in ku ew li ser erdnîgarîya ku jê re Kurdistan tê gotin dijî. Miletê kurd bi nifûsa xwe yek ji mezintirîn miletê herêmê ye û Kurdistan jî bi erdnîgarîya xwe yek ji welatên herî mezin yê Rojhilata Navîn e.

Kurdistan cara yekem di sala 1639an de bi Peymana Qesrî Şîrin, di nav Împaratorîya Osmanî û Împaratorîya Safewîyan de hate dabeşkirin. Ev dabeşkirin heta Şerê Cîhanê yê Yekem berdewam kir. Piştî Şerê Cîhanê yê Yekem, di 24ê temûza sala 1923an de jî bi destê dewletên emperyal yên weke Ingilîstan û Fransayê û bi Peymana Lozanê, Kurdistan di nava Tirkîye, Îran, Iraq û Sûrîyeyê de careke din hate dabeşkirin. Ango, Kurdistan weke kolonîyeke navneteweyî hatîye dagirkirin û dabeşkirin û ev statuya hê jî berdewam dike.

Miletê kurd bêyî îradeya wî hatîye parçekirin û ew bi neheqî û bêdadwerîyeke navdewletî û dîrokî ve rû bi rû maye. Miletê kurd weke miletekî bindest û parçekirî dijî. Ew ji derveyî beşekî Başûrê Kurdistanê, ji hemû mafên xwe yên însanî, neteweyî, demokratîk û kulturî bêpar e. Lê miletê kurd, di tu demê de dagirkerî û dabeşkirina welatê xwe qebûl nekirîye û li hemberî vê neheqîyê, zilm û zordariyê her serî hildaye. Îro jî miletê kurd bi awayên cihêreng xebat û têkoşîna xwe ya ji bo azadîya neteweyî û demokratîk li her çar parçeyên Kurdistanê didomîne. Heta ev neheqî û bêdadwerî sererast nebe û miletê kurd û pêkhatyên Kurdistanê negihêjin mafê xwe yên neteweyî û demokratîk, xwe li welatê xwe îdare neke, wê aştî û aramî li Rojhelata Navîn bi cî nebe. Miletê kurd, îro di nav prosesa tekoşîna rizgarîya neteweyî û azadîyê de, pêngavên stewardîna netewebûna xwe xurttir dike û ew li ser xaka xwe ya nîştimanî, pêkvejiyanê dike destûra jîyana xwe.

Herçiqasî dem, rê û rêbazên wê ji niha ve neyê misogerkirin jî weke millet û welat yekîtîya kurdan û Kurdistanê, mafekî dîrokî, rewa û xwezayî yê miletê kurd e. Di warê yekîtîya netewe û welêt de û awayê pêkanîna wê de, wê miletê kurd û pêkhatyên Kurdistanê bi îradeya xwe ya azad biryarê bidin.

Em têgeha miletê kurd wek sîwana bingeha lehçeyên zimên, ol û mezhebên cuda, pirkulturîya civatê û bawerîyên cihê bi nav dikin. Pirkulturîya

miletê kurd ji yekrengî, yekdengî, înkâr, şovenîzm û asîmîlasyonê bidûrketî ye. Em piretnîkî, pirzimanî, pirolî û pîrbawerîyê weke mozaîk û dewlemandîya Kurdistanê dibînin. Em bîr û bawerî û kulturek weha, weke garantîya pêkvejiyaneke azad, dadwer û demokratîk ya hemû beşên civatê yên Kurdistanê dibînin û vê yekê weke bingehe bernameya partîya xwe pêname dikin.

Çareserîyên pîrsgirêka kurd û Kurdistanê

Pîrsgirêka kurd û Kurdistanê di eslê xwe de pîrsa mafê çarenivîsa milletê kurd e, pîrsa dewletbûnê ye. Partîya me, dewletbûnê (dewletek federal, konfederal an jî serbixwe) weke program û armanceke demdirêj û stratejîk dibîne. Ev armanc xwedîyê bingeheke dîrokî ye; em di vê bawerîyê de ne ku ev daxwazê sereke ya milletê kurd û kurdistanîyan e. Partîya me weke armancek stratejîk çareserîya pîrsa milletê kurd û Kurdistanê, pîrsa rizgarkirina welatekî kolonî, azadkirina miletekî bindest û pêkhatayên Kurdistanê û avakirina civateke demokratîk û dadwerî dibîne.

Lê li gorî şert û mercên welêt û herweha li gorî rewşa navxweyî û navneteweyî, gava derfetên avakirina federasyon yan jî konfederasyonê peyda bibin, em dê ji bo cîbicîkirina bidestxistina wan kêş û derfetan jî bixebitin. Di vî warî da, li gorî şert û mercên Kurdistanê û tevgera rizgarîxwazîya

neteweyî, herweha li gorî rewşa herêmê û navneteweyî dikare çareserîyên cihê û navqonaxî jî derkevin holê. Di rewşeke weha de, em dê çareserîyên demkî û navqonaxî red nekin û wan ji bo bidestxistina armancên sereke û stratejîk weke derfetên girîng û pêwîst binirxînin.

Li Bakurê Kurdistanê ji bo bidestxistina mafên milletê kurd û kurdistanîyan, bi kîjan formên dewletê ango federal, konfederal ya jî serbixwe dibê bila bibê, em dê hewl bidin ku sazûman û sistemeke demokratîk ku xwe bispêre prensîpên azadî, wekhevî û parvekirina adil ava bikin. Armanca partîya me, avakirina sîstem û civateke demokratîk e ku hemû beşên civatê bi awayekî, azad û bextewar têde bijîn. Di vê sîstem û civata demokratîk de armanca sereke ev e ku hemû çîn, ol, etnîk, mezheb, bawerî û zimanên cuda bi hevdû re di nav aştî, azadî, parvekirineke dadwerî û aramîyê de bijîn.

Bêgûman di warê çarenivîsa milletê kurd û Kurdistanê de, biryara dawî ya gelên Kurdistanê ye. Ango; di şert û mercên azad de û bi îradeya xwe ya azad, tenê milletê kurd û pêkhateyên Kurdistanê dikarin li ser çarenivîsa xwe biryarê bidin.

Kurdên li metropolên Tirkîyeyê

Divê em girseya nifûsa bi milyonan kurdên li metropolên Tirkîyeyê dijîn bikin du beş. Yê ku ji dîrokeke gelekî kevn li van deran cîwarbûne û

dijîn û yên ku di vê serdema nû de koçî van deran kirine.

Dewleta Tirk, ji avakirina xwe hetanî îro bi proje û program, bi stratejîyên eşkere û nehênî ji bo tunekirin û asîmîlekirina milletê kurd û pêkhatayên Kurdistanê û têkbirina demografya Kurdistanê di nav hewildaneke piralî û dijwar de ye. Îro li Bakurê Kurdistanê bi milyonan kurd ji ber vê siyaseta, stratejî, plan û projeyên dewleta Tirk neçar mane ku dev ji welatê xwe berdin, koçber bibin û li bajarên derveyî erdnîgarîya Kurdistanê cîwar bibin. Partîya me doza ji bo bidestxistina mafê kurd û kurdistanîyên li metropolên Tirkîyê jî weke beşekî doza azadî û rizgarîxwazîya neteweyî û demokratîk dibîne.

Xelkên me yên ji ber sedemên cihê neçar mane ku koç bikin û li metropolan cîwar bûnin, divê li dijî siyaseta, plan û asîmîlasyona dewletê xwe bi rêxistin bikin. Divê ew di serî de zimanê xwe yê dayikê, urf, adet, kultur û hestên xwe yên neteweyî biparêzin. Em berxwedana kurdên metropolên Tirkîyeyê weke beşekî xebat û têkoşîna tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê dibînin. Herweha, divê xelkên me yên metropolan bi awayekî rêxistinî û çalاک tevbigerin û beşdarî nava xebata demokratîzekirina sîstema dewleta Tirkîyeyê jî bibin.

Divê mafên kurdên li Tirkîyeyê cîwarbûne, weke pêkhateya sereke û li gorî qanûnên navneteweyî cîbicî bibin. Têkoşîna kurdên metropolên li

Tirkîyeyê ya ji bo demokrasî û wekhevîyê wê ji bo serketina têkoşîna azadî û rizgarîxwazîya neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê jî bibe piştgirî û alîkarîyeke mezin. Kurdên li metropolên Tirkîyeyê beşek ji miletê kurd in û di heman demê de, ew bi “hevvelatîya dewletê” ve jî beşekî civata Tirkîyeyê ne.

Divê li Tirkîyeyê zimanê kurdî jî li gel tirkî bibe zimanê resmî. Li bajarên ku kurd lê dijîn, ji dibistana destpêkê heta zanîngehê, mafên perwerdeya bi zimanê kurdî (kurmancî, kirdkî/zazakî) bê nas kirin. Li cihên ku nufûsa kurdan gelek e, sîstemek ku kurd bikaribin di birêveberîyên herêmî de xwe birêve bibin, bê pêkanîn. Ev û maf û azadîyên din yên kurdan, divê di Qanûna Bingehîn û qanûnên din de bêne misoger kirin.

Nasnameya partîyê

Partîya me partîyeke neteweyî, demokratîk, girseyî û eşkere ye. Ew xwe bi tu kes, grup, çîn, dîn an jî mezhebekî tarif nake. Ew ji bo mafên neteweyî, demokratîk û kulturî yên miletê kurd û pêkhatayên etnîkî û olî yên Kurdistanê û ji bo mafên kurdên li metropolên Tirkîyeyê dixebite. Ew bi awayekî giştî, xwe kevneşopî û berdewamîya tevgera azadî û rizgarîxwazîya neteweyî ya Kurdistanê dibîne; li hemû berxwedan, serîhildan û destkevtîyên azadî û rizgarîxwazîya neteweyî xwedî derdikeve. Ew, di

serî de destkevîyên federalî yên Başûrê Kurdistanê, li hemû destkevîyên neteweyî û demokratîk yên her çar parçeyên Kurdistanê xwedî derdikeve û parastina wan destkevîyan weke wezîfeyeke neteweyî dibîne.

Civata Bakurê Kurdistanê bi çand, etnîk, ol û mezhebên cuda ve reng û tevna tevayîya herême di nav xwe de civandiye. Partîya me wê xebat û têkoşîna xwe li gorî vê tevn, pirrengî û pirdengîya Kurdistanê bihûne û wê hewl bide ku tevaya pêkhatayan himbêz bike. Partîya me xebat û têkoşîna xwe dispêre qanûn û prensîpên gerdûnî. Ew di xebat û têkoşîna xwe de, girîngiyeke taybetî dide xurtkirin û geşkirina kultura pirrengî, pirdengî û hevrêzîyê.

Pêkhateyên partîyê

Partîya me; wê ne li ser bingehê îdeolojî, nîjadî û sinifan; wê li ser bingehê hevvelatîya Kurdistanê û weke partîyeke legal, eşkere, neteweyî û demokratîk rêxistina xwe bihûne. Ew dê bixwaze bi awayekî berfireh civata kurd û kurdistanîyên welatparêz û demokrat yên oldar, sekuler, sosyalîst, lîberal û muhafezekar di nav refên xwe de bicivîne û wan bi rêxistin bike.

Divê em bidin diyar kirin ku pirsgirêka Kurdistanê, ne tenê pirsgirêka milletê kurd e; loma jî derîyê partîya me li ser bingehê pirrengî, pirdengî û hevrêzîyê ji hemû kurd û kurdistanîyên

dîndar, sekuler, sosyalîst, lîberal, muhafazakar û hwd yên welatperwer û demokrat re vekirîye. Ew hevvelatîyên ji etnîk, ol, mezheb û bawerîyên cuda ku Kurdistanê wek welat, neteweya kurd wek millet, alaya Kurdistanê wek sembola nîştimanî dibînin û mafê qedera xwe tayinkirinê qebûl dikin, bi rêxistin dike. Ew mafên etnîkî, dînî, bawerî, çandî û demokratîk yên pêkhatayên Kurdistanê li xwe digre. Ew dê bi cudakarîya erênî hewl bide ku pêkhatayên Kurdistanê di organên birêveberî û biryargirtinê ya dewletê de cîh bigrin.

Partîya me, beşdarîya pêkhatayên Kurdistanê ya di xebat û têkoşîna neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê de û di parastina mafên wan yên etnîkî û olî di desthilardarîya sîyasî de weke temînata civateke demokratîk, pirçandî û hevahengîya civata kurd û kurdistanîyan dibîne.

Partîya me, li gor hiqûqa hevdem û peymanên navneteweyî, maf û azadîya mirovî di navenda siyaseta xwe de cîbicî dike. Ew li dijî hemû cudakarîyên nîjadperestî, olî, mezhebî, zimanî, çînî, civatî, cinsî, herêmî û hwd dixebite. Ew, ji bo herkesî mafê azadîya derbirîna ramanî, bawerî û rêxistinîyê diparêze. Bi dijwarî li dijî asîmîlasyon, cûdakirin û dêmarîkirina etnîkî, olî, mezhebî, civakî û herêmî radiweste û wan dîyardeyan qedexe dike.

Awayên xebat û têkoşînê

Bingehê xebat û tekoşîna partîya me Bakurê Kurdistanê ye. Ji bo cîbicîkirina armancên xwe yê neteweyî, demokratîk û kulturî, ew dê hemû rê û rêbazên xebat û têkoşînê yê meşrû, eşkere, legal, sîvîl, demokratîk û bêîtiadîya sîvîl bi hevahengî bi kar bîne. Ew di xebat û têkoşîna xwe de, li gorî hiqûqa navneteweyî tevdiqere. Li gorî şert û mercan, ew dê xebat û têkoşînek guherbar bidomîne û tekoşîna xwe nexer binê îpoteka awayekî xebatê. Guherandin û pêşketinên teknolojîyê, bandoreke mezin li ser awa û metodên xebat û têkoşînê dike. Îro awa, rê û rêbazên xebat û têkoşînê hatine guherandin û gelekî dewlementir bûne. Pêşketinên li dinyayê, rewşa navneteweyî, pêşketin û guherandinên li Rojhilata Navîn, bandorek rasterast li ser Kurdistanê û awayê xebat û têkoşîna tevgera neteweyî û demokratîk dike. Divê tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê jî li gorî van pêşketin û guherandinan xwe amade bike, bihûne û bi rêxistin bike. Partîya me wê xebata xwe ya siyasî, rêxistinî û awayên têkoşînê, li gorî guherandin, rewş û mercên Kurdistanê, herêmê û dinyayê bimeşîne.

Partîya me wê xebat û têkoşîna xwe li ser esasê siyaseteke demokratîk, hevrêzî û kultureke pîrrengî û pirdengî bimeşîne. Ji bo rê li ber çareserkirina pîrsgirêka kurd û Kurdistanê vebe, wê rê, rêbaz û awayên siyasî û demokratîk yê cihêreng bi kar bîne.

Partîya me bêyî ku li benda dewleteke serbixwe, konfederal, federal an jî otonom bimîne, avakirin û geşkirina dezgehên neteweyî, demokratîk, kulturî, zimanî, meslekî û civakî weke beşekî xebat û têkoşîna xwe ya esasî dibîne; vê yekê weke pêşnimûne û temînata pêşeroja civateke demokratîk dinirxîne.

Partîya me xebat û têkoşîna hêzên siyasî û demokratîk ya li ser bingehê daxwazên hevbeş yên miletê kurd û kurdistanîyan, weke hêvanê rizgarî, azadî û dewletbûnê dibîne. Ew, xebat û têkoşîna ji bo pêkanîna îrade û temsîliyek weha ya siyasî, neteweyî û berfireh, weke wezîfeyeke xwe ya esasî dibîne.

Partîya me meşrûyeta xwe ji doza miletê kurd û pêkhatayên Kurdistanê yên mafdar û rewa digre. Ew xwe girêdayî nirxên xwezayî yên demokratîk û prensîpên hiqûqa gerdûnî yên ku bûne malê mirovahîyê dibîne. Di xebat û têkoşîna xwe de van nirx û prensîpan ji xwe re rêber digire.

Pirsa hîlbijartinan û Parlamentoya Tirkîyeyê

Li gorî Qanûna Bingehîn ya Dewleta Tirkîyeyê ku li ser înkâr, tune kirin û asîmîlasyona miletê kurd û kurdistanîyan hatiye avakirin; li gorî qanûnên partîyan û hîlbijartinan; li gorî sonda parlamenterîyê; li gorî Destûra Navxweyî ya Parlamentoya Tirkîyeyê; herweha li gorî vê sazûmana parlamentoya heyî ku zimanê kurdî

wek “zimanekî nenas” pênase dike, wê ev parlamento bi vî awayê xwe nikaribe pirsra milletê kurd û Kurdistanê çareser bike; herweha wê nikaribe demokrasî, azadî, wekhevî û edaletek rasteqînî jî pêk bîne.

Partîya me li gorî şert û mercên dema hilbijartinan, wê rewşê binirxîne û wê siyaset û helwesta xwe diyar bike. Li gorî şert, rewş û konjonktura dema hilbijartinan, em dikarin beşdarî hilbijartinên parlamentoyê, beledîyan û herêmî bibin; lê herweha em dikarin hilbijartinan boykot jî bikin. An jî em dikarin beşdarî hilbijartinên şaredarîyan û herêmî bibin, lê hilbijartinên parlamentoyê boykot bikin. Di vî warî de jî li gorî şerd û mercên dema hilbijartinan, dikare çend alternatîf derkeve pêşîya me. Em dikarin beşdarî hilbijartinên parlamentoyê bibin û gava em bi ser ketin, em sonda parlementerîy nexun û neçin parlamentoyê. Herweha em dikarin weke gelek qadên din, parlamentoyê jî weke qadeke xebat û têkoşînê ji bo doza meşrû ya azadîya gelê xwe û daxwazên acîl yên milletê xwe bi kar bînin.

Di dema hilbijartinan de, ji bo maf û daxwazên meşrû yên doza neteweyî, demokratîk û çandî; herweha ji bo daxwazên acîl yên milletê kurd û kurdistanîyan em dê hewl bidin ku bi partîyên din yên kurd û Kurdistanê re platform, zemîn û qadên xebat û têkoşînê yên berfireh, cihêreng û hevbeş ava bikin.

Partîya me, li gorî çarçeweya li jor hatiye diyar kirin û li ser esasê ku kurd jî weke alîyekî bê qebûl kirin; wê bi derdoreke herî berfireh yên kurd û kurdistanîyan re, siyaseteke ku maf û daxwazên miletê kurd yên azadî, neteweyî û demokratîk bingeh digre bimeşîne.

Pirsa yekîtî û hevkarîyan

Partîya me pirsra yekîtî û hevkarîyên hêzên sîyasî û demokratîk yên Bakurê Kurdistanê bi awayekî giştî di sê xalan de dibîne:

1) Pirsra yekîtîya sîyasî û rêxistî

Di rewş û mercên îro de, li Bakurê Kurdistanê pêwîstî bi partîyeke neteweyî, demokratîk, legal û êşkere ya berfireh û xurt heye. Di vê pêvajoya ku tevgera neteweyî û demokratîk ya Bakurê Kurdistanê tê de derbas dibe, avakirina partîyeke weha bi yekîtîyeke siyasî ya nava partî, rêxistin û kadirên siyasî yên xwedîyê xetêke neteweyî, demokratîk û kurdistanî mumkun e.

Di vî warî de, em avakirina partîya me ya encamê xebateke hevbeş ya siyasî û rêxistinî weke gaweke esasî û girîng dibînin. Lê ji bo berfirehkirin, xurtkirin û geşkirina wê, dê hewildan û xebatên me berdewam bin û dê derîyê me ji beşdarîyên nû re vekirî be. Yekîtîya sîyasî ya tevger, derdor û kesayetîyên neteweyî dê herdem di rojeva partîya me de wek wezîfeyeke mayende be.

2) Hevkarîya stratejîk ya partî û rêxistinên kurdistanî

Em bidestxistin û garantîya azadî û mafên neteweyî û demokratîk, di pêkanîna yekîtî, hevkarî û îradeyeke siyasî ya berfireh û hevbeş de dibînin. Çawa ku em yekîtîyeke siyasî û rêxistinî pêwîst û girîng dibînin; herweha em li ser xeteke neteweyî, demokratîk, azadîxwaz û kurdistanî avakirina hevkarîyeke berfireh jî pêwîst dibînin. Em avakirina hevkarî û tifaqeke kurdistanî ya berfireh û mayende, weke beşekî xebat û têkoşîna azadî û rizgarîxwazîya neteweyî û demokratîk ya stratejîk dinirxînin.

3) Hevkarî û platformên li ser daxwazên acîl û avakirina temsîleke neteweyî

Bêgûman xebat û têkoşîna azadî û rizgarîxwazîya neteweyî û demokratîk xebateke demdirêj e û wê di gelek qonax û navqonaxan de derbas bibin. Herweha em dizanin ku bidestxistina her maf û destkevtîyan jî wê ji bo gihaştina armancên stratejîk bibin pêngav, derfet û destkevtîyên nû.

Partîya me di vê bawerîyê de ye ku avakirina platform, hevkarî û tevkarîyên berfireh yên li ser "Daxwazên acîl yên miletê kurd" ku li jêr hatine diyar kirin, wê bikaribe bêtir rê li ber çareserîya pîrsa miletê kurd û kurdistanîyan xweş bike û wê ji bo avakirina hevkarî û tifaqên stratejîk yên neteweyî, demokratîk û kurdistanî jî bibin destpêk û zemînên baş. Loma jî partîya me gelek girîng

dibîne ku partî, rêxistin, dezgehên sivil û demokratîk yê kurdan li ser esasê daxwazên hevbeş û acil yê miletê kurd temsîliyê herî berfireh ya siyasî, civakî û sivil pêk bînin:

Li Kurdistana azad, sîstema rêxistinî, desthilatdarî û jiyana civakî

Kurdistan welatekî piretnîkî, pirolî, pirçandî û pirleheçeyî ye. Desthilatdarî û birêvebirina dewletê jî divê li gorî vê pirrengî û tevna civatê bê hûnandin. Li Kurdistana azad, divê civat bi sîstemek parlamenterîya demokratîk ku ji temsîliya tevaya pêkhateyan pêkhatî, bê birêvebirin. Partîya me, pêkanîna balans û hevahengîya nava hêza qanûn çêkirinê, birêvebirina mahkemeyên azad û birêvebirina desthilatdarîya siyasî, garantîya sîstemeke demokratîk û dadwer dibîne. Parlamento dezgeha sereke ya qanûnçêkirinê ye û cîyê biryargirtina birêvebirina dewletê ye.

Ji bo cudakirina hêzên birêvebirina desthilatdarîyê, ji bo misogerkirina maf û azadîyan û ji bo dadwerîyeke civakî, divê qanûneke bingehîn ya demokratîk, li ser bingeha hevvelatîyê û peymanî civakî bê amadekirin. Di vê Qanûna Bingehîn de, divê mafên hemû etnîk, ziman, lehçe, ol, mezheb û statuya desthilatdarîya herêmên xweser bêne misoger kirin.

Herêmên xweser wê bi meclîsên herêmî bêne îdarekirin. Di meclîsa merkezî û di meclîsên herêman de, wê hemî pêkhateyên Kurdistanê bêne

temsîlkin. Her pêkhate wê bi navê xwe û bi nasnameya xwe di meclîsan de bêne temsîlkin. Di meclîsan de, li gel zimanê kurdî, hemû zimanên pêkhateyan wê weke zimanê fermî bêne qebûl kin.

Meclîsên herêmên xweser, di birêvebirina perwerde, çand, tendurustî, ewleyî û asayîşa tevaya herêmê de wê xwedî desthilatdarîyên berfireh bin.

Namzetên pêkhateyan yê ku dengên wan têrî hîlbijartinê nakin, wê beşdarî hîlbijartinan bibin û wê li gorî dengên girtine di sîstema kotaya wî pêkhateyî de bêne hîlbijartin. Temsîliyeta pêkhateyan wê li hemû meclîsan bi qanûnê bê misoger kin. Ev prensîp wê ji bo meclîsa giştî û meclîsên herêmî jî derbas bibe.

Di mijarên esasî yê îdarekirina dewletê, maf û azadîyên hevvelatîyan de, wê bi rêya referandûmê biryar bêne girtin. Partîya me, wê bixwaze ji bo her çareserîya pîrsgirêkek herêmî yan jî merkezî ku tevaya welêt yan jî tevaya herêmê eleqeder dike, biçe referandûmê.

Sîstema birêxistinê û desthilatdarîya Kurdistana azad wê ne merkezî be. Ew dê li gorî herêm, lehçe, ol, etnîk û bawerîyên cuda, sîstemek demokratîk, dadwer û ademîmerkezî be. Sîstema ademîmerkezî, wê ji rê û rêbazên avakirina sîstemeke navxweyî ku ji herêmên otonom, federal û herêmên otonomîya çandî pêk bên re vekirî be.

Statuya ziman, zarava û perwerdeyê

Kurdistana azad, bi kîjan statuyê dibe bila bibe, wê dewleteke pirçandî, pirzimanî, pir lehçeyî û pir etnîkî be. Kurdistana azad, wê welatekî demokratîk û dadwer yê hemû pêkhatayan be; ew dê cîyê pêkvejiyana çand û bawerîyên cuda be.

Partîya me, hemû ziman, lehçe û çandên li Kurdistanê li gorî prensîpa wekhevîya maf û azadîyan qebûl dike. Bi tedbîrên qanûnî, wê pêşîya asîmîlasyon, cihêkirin, dêmarîkirin û astengên civakî ji hemû cudahîyan re bigire. Li Kurdistana azad, asîmîlasyon û dêmarîkirin wê qedexe be.

Perwerdeya bi zimanê dayikê, wê bingeha sazûmana perwerdeya Kurdistana azad be û wê di Qanûna Bingehîn de bê misoger kirin. Hemû pêkhateyên etnîkî yên Kurdistanê yên weke asûrî/suryanî, keldanî, ermenî, ereb, tirk û hwd wê bi zimanê xwe perwerde bibin.

Li Bakurê Kurdistanê, teva zimanên din yên pêkhateyên Kurdistanê, wê zimanê kurdî bi du lehçeyên xwe kurmancî û zazakî (kirdkî/kirmanckî) lehçeyên fermî bin. Li welêt, li herêmên ku kurmancîaxêf di piranîyê de bin, kurmancî dê lehçeya sereke ya wê herêmê be; kirdkî wê lehçeya axaftinê û di dezgehên dewlet û di sîstema perwerdeyê de fêrbûna bi kirdkî mecbûrî be.

Herêmên ku kirdkîaxêf di piranîyê de bin, li wê herêmê dê kirdkî lehçeya sereke ya wê heremê be;

kurmancî wê lehçeya axaftinê û di dezgehên dewletê û sîstema perwerdeyê de fêrbûna bi kurmancî mecbûrî be.

Sîstema aborî

Hemû çavkanîyên dewlemendîya sererd û binerdên Kurdistanê, hemû daristan, çem û çavkanîyên din, malên hevbeş yên hemû gelê Kurdistanê ne. Ev hemû nirx û dewlemendîyên welêt dê di bin desthilatdarîya dewletê de, ji bo berjewendîyên gel bêne bikaranîn.

- Budçeya dewletê wê li gorî nufûsa herêman û bi awayekî dadwerî di nava herêman de bê parvekirin. Her herêm wê bi rêya meclîs û rêveberîya xwe di birêvebirina budçeya xwe de desthilatdar be.

Li Kurdistana azad, teva hatinên din yên mîrî, bac wê bingehêke esasî ya budçeya dewletê be. Her herêm wê bi meclîs û birêveberîya xwe li ser vê budçeyê desthilatdar be.

Peywendîyên navneteweyî

Dewletên emperyalîst di dabeşkirina Kurdistanê de daxwaz, vîn û hesta milletê kurd nedan ber çavan û tenê li gor berjewendîyên xwe hereket kirin. Ew li dijî avakirina dewleteke serbixwe ya Kurdistanê rawestîyan.

Lê milletê kurd di tu demê de, dagirkirin û dabeşkirina Kurdistanê qebûl nekir û hudûdên ku bi destên dewletên emperyalîst hatin xêzkirin nepejirand. Milletê kurd nêzî 200 salî ye ji bo azadî û rizgarîya neteweyî li dijî dagirkirin, dabeşkirin û kolonîkirina Kurdistanê di nav serhildan û têkoşînê de ye. Lê dewletên mezin di van serhildan û berxwedanên kurdan de pirê caran piştgirîya dewletên dagirker û kolonyalîst kirin û nexwestin dengên kurdan bibihîzin. Pêwendîyên dewletên mezin û dewletên Kurdistan dagîr kirine li ser bingehê berjewendîyên dewletên mezin yê di dema xwe de biryardêr bûn, hatine ava kirin.

Piştî rûxîna sîstema duserî ya cîhanê, li dinyayê û herêma me rewşek nû derkete holê. Di vê rewşa nû de, di encama mudaxela Amerîkayê ya 1991 û 2003an ya Iraqê û herweha bi piştgirîya Amerîka û Fransayê li ser beşekî Başûrê Kurdistanê mercên avakirina herêmeke federal hate holê. Lê siyaseta navdewletî ya li dijî avakirina dewleteke serbixwe ya Kurdistanê bi awakîyekî giştî hê jî berdewam dike.

Helwesta dewletên mezin li hemberî referandûma serxwebûna Başûrê Kurdistanê, careka din siyaseta van dewletan derxist holê. Ji ber vê siyaseta navdewletî ya li dijî avakirina dewleteke serbixwe ya Kurdistanê, Kurdistan û milletê kurd hê jî di nav çar dewletan de hatîye dabeşkirin û ne xwedî dewlet û statuyeke serbixwe ye.

Dewletên emperyal û mezin ji bo parvêkirin, hegemonya û desthilatdarîya cihanê di nav hewldan û berberîyek nû de ne. Dinya bi awayekî duserîtî, heta sêserîtîya dewletên mezin ji nû ve tê dîzayn kirin. Ji alîyekî Rûsya û peykerên wê, ji alîyekî Çîn û peykerên wê, li alîyê din jî Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA), Îngilîstan, Yekîtiya Ewropayê û NATO ref û sefên xwe ji nû ve dihûnin.

Di vê pêvajoyê de şerên herêmî û bi taybetî şer û berberîyên li Rojhilata Navîn, berfirehtir û diwartir dibin. Dewletên dagirker û statukoperest bi dijarî li dijî daxwazên guherînên statukoya herêmê radiwestin.

Li Rojhelata Navîn, bi navê DAÎŞ, El Nusra, El Qaîde û wekî din, hêzên terorî li ser destên dewletên dagirkerên Kurdistanê û dewletên mezin bi hêz dibin û bi kiryarên xwe yên terorîstî û hovane dibin xeterek mezin li dijî mirovahîyê. Li Rojhelata Navîn, milletê kurd û kurdistanî li dijî van hêzên terorîst û hov bi alîkarîya hêzên hevpeyman, têkoşîneke bêhempa û bêrawestan domandin û xeterîya wan hêzên terorîst li herêmê kêmtir kirin.

Di vê pêvajoyê de, milletê kurd hem ji bo rizgarî û azadîya welatê xwe têdikoşe û hem jî ji bo guherîna statukoya Rojhelata Navîn tevdigere. Vê gavê li Iraq û Surîyeyê hebûna hinek dewletên mezin û hevpeyman ya di serokatîya DYA û hinek berjewendîyên wan bi berjewendîyên milletê kurd û kurdistanîyan re lihevhatî ye. Bêguman têkoşîna

neteweyî û demokratîk ya miletê kurd û kurdistanîyan li dijî dagirkerî û kolonyalîzmê ye. Di vê xebat û têkoşînê de pêwîstîya miletê kurd û kurdistanîyan bi alîkarî û piştgirîya dewletên mezin heye.

Loma jî partîya me di têkilîyên xwe yên navnetewî de berjewendîyên miletê kurd û Kurdistanê esas digre û sîyaseta xwe li gor vê rêbazê bi rêve dibe. Di têkilîyên xwe yên navneteweyî de, bingehe sîyaseta partîya me, wê dost û piştgirên doza xwe zêdetirkirin û neyarên doza xwe jî kêmtirkirin be. Partîya me, wê dîplomasî û sîyaseta xwe ya navneteweyî li ser neyartîya tu dewlet û miletan ava neke; ew dê pêwendîyên xwe li ser dijminatî û berberîya netewe û gelên din bi rê ve nebe. Partîya me, wê di siyaseta xwe ya navneteweyî de, li dijî neheqî û bêdadwerîyê raweste û wê piştgirîya xebat û têkoşînên ji bo azadî, demokrasî, wekhevî û dadwerîyê bike.

Pêwendîyên nav beşên Kurdistanê

Em li hemû parçeyên Kurdistanê mafê çarenivîsa neteweya kurd weke mafekî herî rewa dibînin û diparêzin. Em ji bo çareserîya pirsê miletê kurd û Kurdistanê giranîyeke taybetî didin hebûn û destkevtîyên Dewleta Federe ya Başûrê Kurdistanê û destkevtîyên li parçeyên din yên kurdan. Em parastina Dewleta Federe, piştgirîya xebat û têkoşîna ji bo serxwebûn an jî

konfederasyona Başûrê Kurdistanê, ji bo berfirehkirina demokrasîyê, weke erkekî niştîmanperwerî û neteweyî dibînin. Her beşê Kurdistanê wê li gorî şert û mercên xwe forma desthilatdarîya beşên xwe ava bike. Di nav beşên Kurdistanê de, awayên pêwendîyên neteweyî û hevrêzîyê pêdivîyên bingehîn in.

Teva ku pêkanîna kongreyeke neteweyî û avakirina dezgeheke hevbeş yên her çar parçeyan pêwîstîyek e, lê em di van şert û mercên ku tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê têde derbas dibe de, rewşa herêmê û konjuktura navneteweyî ji bo pêkanîna "Kongreya Neteweyî" guncav nabînin. Lê divê em ji niha de ji bo avakirina navendeke pêwendîyan ya hevbeş ku bikaribe danûstendinên nav partî, rêxistin û dezgehên neteweyî, demokratîk, civakî û kurdistanî yên her çar parçeyan berfirehtir û geştir bike, hewl bidin. Ev dê rê li ber xebata pêşerojê ya kongreyeke neteweyî jî xweş bike.

Li rojavayê Kurdistanê, divê li ser esasê neteweyî û demokratîk û beşdarîya hemû hêzên welatparêz avakirina statuyeke siyasî, cografî û desthilatdarîyeke demokratîk û xweser were armanc girtin. Desthilatdarîyeke yekreng, yekdem û totalîter bi şert û mercên navneteweyî û bi pêşveçûna neteweyî, ne lihevhatî ye û zerarê dide siberoja rojavayê Kurdistanê. Divê milletê kurd li rojavayê Kurdistanê li ser esasê Mitabaqata Hewlêrê û Dihokê, îdareyeke hevbeş ya lêşkerî,

sîyasî, aborî û dîplomatîk ava bikin. Di vê pêvajoyê de rewşa taybetî de, rîya çareserî û bidestxistinên mafên neteweyî û demokratîk yê dîrokî, di yekîtî, hevrêzî û têkoşîna hevbeş ya hêzên neteweyî û demokratîk yê Kurdistanê Rojavayê de derbas dibe.

Ji bo bidestxistina mafê çarenivîsa milletê kurd li Rojhelatê Kurdistanê jî pêdivî bi yekgirtineke sîyasî, hevrêzî û hevkarîyeke neteweyî heye. Li rojhelatê Kurdistanê avakirina hevkarîyeke neteweyî û berfireh ya li dijî dewleta Îranê, wê bibe destpêka serkeftinê.

Dîyaspora Kurdî

Dîyaspora kurdî bi xebata xwe û bi pêwendîyên xwe yê navneteweyî beşek ji tekoşîna milletê kurd û Kurdistanê ye. Ew di nav pêvajoya têkoşîna neteweyî, demokratîk û kurdistanî de xwedî roleke girîng e. Herweha ew di warê diplomasiyê, ziman û çanda kurdî de jî xwedî rolek mezin û taybetî ye. Loma jî tevgera kurdistanî ya her çar parçeyên Kurdistanê divê li ser siyaseteke hevbeş ya neteweyî, demokratîk bikaribin di bin sîwaneke temsîlkar de dîyaspora kurd û Kurdistanê bicivîne. Xebat û struktura dîyaspora kurd û kurdistanî divê ji sîyaseta partî û tevgeran bidûrketî û li ser bingehe rastîya welat û pêwîstîyên tevgera neteweyî û demokratîk bê hûnandin.

Îro dîyaspora kurdî ji navend û banekî hevbeş bêpar e. Partîya me pîrsêrîtîya dîyaspora kurdî rast nabîne û ev rewş bi awayekî giştî li dijî berjewendîyên tevgera neteweyî, demokratî û kurdistanî ye. Em di vê bawerîyê de ne ku divê hemû alîyên ku îro hene, di vî warî de bi berpirsiyarî û hişmendîyek neteweyî û kurdistanî tevbigerin.

Ji bo dîyaspora kurdî di binê navend û banekî hevbeş de bicive, hemahengî û hevrêzîya nava wê pêk were, divê em bi hemû hêz û îmkanên xwe hewl bidin û bixebitin. Ji bo pêkanîna vê aramancê, em amade ne ku bi hemû hêz û kesayetîyên eleqedar re pêwendîyan deynin û hewl bidin ku bi awayekî hevbeş çareserîyekê ji vê belavbûn û pîrsêrîtîyê re bibînin.

Maf û azadîyên jinan

Di civata Kurdistanê de, jin teva zilm û zordarîya neteweyî, ji gelek mafên xwe yên bingeîn jî bêpar in. Teva şert û mercên gelek zor û giran, di xebat û têkoşîna neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê de, cîyekî gelekî girîng û taybetî ya jinan heye; wan her dem mil daye milên mêran, bûne hevparên qedera wan û heta ji mêran bêtir jan û azarî kişandine. Bêguman, ev fedakarî û êşa jina kurd vala neçûye. Di têkoşîna neteweyî û demokratîk de, êdî jina kurd, hem di warên neteweyî û sîyasî de, hem jî di warên têgehîştina mafên xwe yên

taybetî de pêşketineke berbiçav nîşan dide. Ev xebat û têkoşîna jina kurd, zanistî û têgihiştina wê ya di warên neteweyî, sîyasî û mafên jinan de geştir û berfirehtir kirîye. Ew êdî di qada xebat û têkoşîna rizgarîxwazîya neteweyî de û di nava civatê de, xwedî cih û roleke gelek girîng û taybetî ye. Bi geşbûna xebat û têkoşîna rizgarîya neteweyî, beşdarîya jina kurd ya nava vê xebat û têkoşînê jî geştir û berfirehtir dibe.

Di parastîna zimanê dayikê û kultura kurdî de, roleke sereke ya jin û dayika kurd heye. Li hemberî asîmîlasyon û jenosîda li ser zimanê kurdî, kozik û çepera herî girîng ya milletê kurd, ev rola jina kurd e. Ne bi saya serê jin û dayikên kurdên ku li malên xwe bi zarokên xwe re bi kurdî dipeyivin bûna; wê asîmîlasîyon û jenosîda li ser zimanê kurdî, gelekî dijiwartir û berfirehtir bûya.

Di nava sînorên mafdar û rewa de, mafê her beşên civatê yê xwebirêxistinkirinê heye. Weke her beşê civatê, divê jin jî bi awayekî azad xwe bi rêxistin bikin. Birêxistinbûna jinê, mafê wê yê herî xwezayî ye û ev maf garantîya pêşketin û azadîya wê ye. Herweha divê bê zanîn ku di welatekî de eger mafê xwebirêxistinkirin û azadîya jinê pêk neyê, wê di wî welatî de civateke demokratîk jî nayê damezrandin.

Partîya me, xebat û têkoşna li dijî zilm, zordarî û neheqîya neteweyî, cinsî, aborî û civakî ya li ser jinên kurdistanî û herweha ji bo jiholêrakirina

pêwendî û hegemonyaya desthilatdarîya zilêm ya li ser pîrekan weke wezîfeyeke xwe ya esasî dibîne. Partîya me wê bi awayekî berdewamî ji bo pêkanîna hemû maf û azadîyên jinan yê ji peymanên navneteweyî tên jî bixebite û wan bi qanûnên pêwendîdar misoger bike. Ew dê di vî warî de, ji tecrûbeyên welatên din jî îstifade bike.

Pirsa ciwanan

Weke her civatê, di civata Kurdistanê de jî ciwan endamên civatê yê herî zîndî û dînamîk in. Di dîroka me ya nêzîk de, di warê ramanî, sîyasî û rêxistinî de, di warê xebata eşkere û demokratîk de, di hemû beşên têkoşînê de, ciwanên kurdan herdem di refê pêşî yê têkoşînê de cîyê xwe sitendine. Di vê pêvajoyê de, ciwanên kurdan berdêleke giran dane û hê jî didin. Ji niha û pê ve jî eger berê wan ber bi armancên sîyasî yê rast bêne vekirin, ciwanên kurdan wê di guherandina çarenivîsa milletê kurd de, rolên gelek girîng û çalak bilîzin.

Di warê aborî, civatî, çandî, sîyasî û rêxistinî de, pirsgerêkên ciwanên kurdan yê taybetî û girîng hene. Divê em bi awayekî ciddî li ser van pirsgerêkan bisekinin û ji wan re çareserîyê bibînin. Di têkoşîna neteweyî û demokratîk de, pirsra perwerdekirin û xwebirêxistinkirina ciwanan, bi serê xwe mijareke gelek girîng û zîndî ye ku divê em bi hûrgilî li ser vê pirsê rawestin. Divê ciwanên kurdan bi helwest û

çalakîyên xwe weke dînamîkeke girîng di têkoşîna neteweyî û demokratîk de cih bigrin. Ji ber ku ciwan yek ji hêza pêşketin û geşkirina tevgera neteweyî û demokratîk e.

Yek ji wezîfeya ciwanên kurdan ya sereke jî bi evîndarîyeke neteweyî, hînî dîrok, ziman û çanda xwe bibin. Divê ew di vî warî de, xwe perwerde bikin û xwe bi rêxistin bikin. Ji ber ku ciwanekî ji zanîn û hişmendîya neteweyî bêpar be; neperwerdekirî û bêrêxistinî be, wê ji şexsîyet û civata xwe bi dûr keve û wê bi hêsanî asîmîle bibe.

Divê ciwanên kurdan, di her waran de xwe bi pêş bixin û rêxistinên xwe yên neteweyî ava bikin. Lê divê tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê jî girîngîyeke taybetî bide xebata ciwanan û ji bo wan bername û projeyên taybetî amade bike. Divê ji bona ku ciwan bikaribin di warê neteweyî, civatî, teorîk û çandî de xwe perwerde bikin, alîkarî û piştgirîya wan bê kirin.

Pirsa tenduristîyê

Mafê jîyanê mafê herî bingehîn yê herkesî ye. Loma jî li gorî me divê xizmetên tenduristîyê belaş bin. Partîya me tenduristîya civatê yek ji pêwîstîyên jîyanê yê bingehîn dibîne. Di vî warî de, partîya me wê hewl bide ku zanyarî, tecrûbe û teknolojîya navneteweyî bîne Kurdistanê. Ji bo vê armancê wê bername û projeyên taybetî amade bike. Divê em di warê pirsra tenduristîyê de, giranîyê bidin

pêşvebirina sektora dewletê, lê herweha em pêwîstîya sektora şexsî jî ji bîr nekin.

Pirsa jîngeh û xwezaya Kurdistanê

Hêzên dewleta tirk di şerê ji bo tunekirina milletê kurd de, bi çekên giran gelek şûnwarên dîrokî, jîngeh û xwezaya Kurdistanê jî şewitandin, rûxandin û wêran kirin. Ev sîyaseta dewletê ya rûxandin û wêrankirinê ku bêwestan berdewam dike, di van salên dawîn de diwartir û berfirehtir bûye. Di encama sîyaseta dewleta tirk ya "bêmirovhîştina Kurdisatanê" de, gelek gund, bajar, bajarok û herêmên bakurê Kurdistanê hatine rûxandin û wêran kirin. Dewleta tirk, vê sîyaseta xwe bi hemû îmkanên xwe, îro li başûr û rojavayê Kurdistanê jî dixê jiyane. Dewleta tirk, zerarên ku daye dewlemendiyên me yê dîrokî, jîngeh û xwezayê, gelek mezin û berfireh in. Di nava van 30-40 salên dawîn de, bi destê dewletê û bi awayekî sistematîk şewitandina daristanan, rewşa seqa, avûhewayê û ahenga xwezaya welatê me xera kirîye. Ev bûye sedemê tunekirina gelek cûreyên gul, çiçek, şînkayî, çûk û heywanên kovî û rêyeke mezin li ber herifandina axê vekirîye. Bi çekirina bendav û golan, gelek şûnwarên dîrokî yê li Kurdistanê, di bin avê de hatine hîştin; gelek navçe û deverên ku bi kêrî çandiniyê tî jî binav bûne.

Parastîna mîras û rûmetên dîrokî û geşkirina têgehîştina jîngeh û hawîrdorê, li tevahîya cîhanê

bûye berpîrsîyarî û wezîfeyêke girîng ya hevbeş ya mirovahîyê. Tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê jî divê ji bo parastin û geşkirina mîras û hêjayîyên dîrokî, çandî û herweha parastina jîngeh, xweza û erdnîgarîya Kurdistanê, sîyaseteke berbiçav biafirîne û di vî warî de gelê me perwerde û şîyar bike. Di vî warî de, pêwîstî bi lêkolînên zanyarî û programên perwerdeya têgihîştin û hişmendîyêke neteweyî û dîrokî heye. Partîya me, wê piştgirîya xebat û hewldanên di vî warî de bike û li gorî hêz û îmkanên xwe di nav wan de cî bigre.

Daxwazên acîl yên partîya me

Siyasetên kolonyalîst yên li ser esasê înkâr, îmhâ, sirgûn û asîmlasyonê yên Dewleta Komara Tirkîyeyê ku heta niha hatîye meşandin, zerareke gelek mezin daye tevn û hebûna neteweyî û demografîya Kurdistanê û texrîbatên mezin pêk anîye. Ev siyaseta dijminatî di şert û mercên îro de bêtir bi dijwarî berdewam dike. Dewleta Komara Tirkîyeyê li gorî hiqûq û qanûnên xwe yên hene jî tevnagere. Parlementer û birêveberên mehelî berteraf dike, bi tayinkirina qeyûman jî îradeya bi milyonan dengdêran bînpê dike. Partîya me diyar dike ku divê Dewleta Komara Tirkîyeyê li gorî hiqûq û peymanên navneteweyî tevbigere. Prensîp û mafên hîlbijartin û xwehîlbijartinê li dinyê maf û prensîpekî demokrasîyê ye ku nikare tune bê hesabandin; ew mafekî bîngêhîn e ku nayê dev jê berdan û nayê dewir kirin.

Rewşa heyî, ne tenê zerarê dide mîletê kurd û pêkhatayên Kurdistanê, herweha ev zerarê dide gelê tirk, gelên din yên li Tirkîyeyê dijîn û nîrxên demokrasîyê. Ji bo ev zerar û têkberin kûrtir nebe; Ji bo pêkanîna rewşeke demokratîk li Tirkîyeyê û li ser vê zemînê ji bo bi rêyên demokratîk û aştîyane pîrs û pîrsgirêk bêne çareserkirin û mafên bîngêhîn yên mîletê kurd û pêkhatayên Kurdistanê bê bîdestxistin, partîya me pêkanîna van daxwazên acîl yên li jêr hatine diyar kirin pêwîst dibîne û ji bo wan têdikoşe.

Partiya me, di vê bawerîyê de ye ku avakirina hevkarî û platformên li ser daxwazên acîl, hem ji bo avakirina yekîtiyên demdirêj yên neteweyî û demokratîk, hem jî ji bo rê li ber çareserîya pirsê kurd û Kurdistanê xweş bike, wê bibe pêngavek girîng. Partiya me, ji bo partiyên siyasî, rêxistin, derdor, kesayetiyên civakî, dezgehên sivil û demokratîk bîna cem hevdu; di nav xwe de û bi mixatabên xwe li derdora talebên acîl, temsîliyeteke hevbeş ya kurdî ava bike, dixebite.

- Di şert û mercên heyî de, amadekirina qanûneke bingehîn ya li gorî hiqûqa hevdem bê avakirin ku di serî de mafên neteweyî, kulturî û demokratîk yên miletê kurd, lê herweha miletên cihê, civatên etnîkî û olî yên li Tirkîyeyê dijîn bêne misoger kirin, yek ji wezîfeyên herî pêşî ye.

- Ji bo pirsê kurd û Kurdistanê bi rêyek siyasî, demokratîk û wekhevî çareser bibe; divê hebûna miletê kurd bê qebûl kirin, mafên neteweyî û demokratîk yên kurdan bêne naskirin, ev maf di qanûna bingehîn ya demokratîk ku wê bê amade kirin de bêne garantî kirin.

- Divê zimanê kurdî li gel zimanê tirkî bibe zimanê resmî. Mafê perwerdekirin û hînkirinê bi zimanê dayikê ji bo zimanê kurdî (kurmancî û kirdkî/zazakî) bê nas kirin û ew maf bi Qanûna Bingehîn û qanûnên pêwendîdar bê misoger kirin.

- Divê hemû qedexeyên astengên di Qanûna Bingehîn û qanûnên di derbarê derbirîna azadîya fikrê û

xwebirêxistinkirinê de bêne rakirin. Divê hemû qedexeyên li ser navê Kurdistanê ji holê bêne rakirin û kurd bikaribin bi navê kurd û Kurdistanê û bi awayekî azad partîyên xwe yê sîyasî û dezgehên xwe yê civakî, kulturî û demokratîk damezrînin. Divê ev guherandin û maf bi Qanûna Bingehîn û qanûnên pêwendîdar bêne misogerkin.

- Divê kesên bi hîlbijartinê hatibin, bi hîlbijartinê herin. Li ser esasê prensîpa parêzbendîya kursîyê, divê hemû parlementerên girtî û mahkûm bêne azadkirin û siyaseta qeyûmê ji holê bê rakirin.

- Divê Dewleta Komara Tirkîyeyê li gorî xala 90î ya Qanûna Bingehîn ku garantî dike wê li gorî hiqûqa navneteweyî tevbigere, pêk bîne; bê qeyd û şert pabendî peymanên Yekîtîya Neteweyan û Yekîtîya Ewropayê (Krîterên Kopenhagê, Şertên Otonomîyên Herêmî û Bireveberîyê yê Ewropayê û Girêbesta Mafên Zarokan ya Yekîtîya Neteweyan) yê ku îmze kirîye bimîne û demildest têbinî û îtirazên xwe yê li ser van peyman û girêbestan rake.

- Divê hemû nav û navnîşanên bajar, gund, herêm û deveran yê bi kurdî ku bi tirkî ve hatine guherandin ji nu ve bi kurdî werin nivîsîn û hemû astengî û qedexeyên qanûnî û fiîli yê di vî warî de ji holê bêne rakirin.

- Divê hemû kesên ji ber pirsra kurd û Kurdistanê û ji ber bîrûbawerî û çalakîyên sîyasî di zîندان de ne, demildest bêne azad kirin. Dozên di derheqê wan

kesên neçar mane li derveyî welêt weke penaber bijîn bêne rakirin, ew bikaribin paşde vegerin û hemû astengên li pêşîya bi azadî siyasetkirina wan bêne rakirin; di van waran de, qanûn û Qanûna Bingehîn bêne guherandin.

- Divê zilm û zordarîya fiilî û civakî û astengên qanûnî li jinan dibin bêne rakirin, ev di qanûnan û Qanûna Bingehîn de bêne misogerkin. Divê demildest Girêbesta Stenbolê têkeve jiyanê.

- Di serî de elewî, ehlîheq û êzidî, divê zilm û zordarî û astengkirinên fiilî û civakî yên li ser hemû ol, mezheb û bawerîyan ji hole bêne rakirin; azadîya bawermendîyê ji alîyê dewletê ve bê misogerkin. Divê dawî li helwesta dewletê ya ku mezheba Henêfî weke mezheba dewletê dipejirîne bê anîn; herweha dive dewlet dawî li siyaseta dêmarîtîyê ya li ser mezhebê Şafî bîne û li hemberî hemû mezheban wekhev tevbigere.

- Cîhên mezelên mezinên kurdan yên wek Şêx Seîd, Xalid Begê Cibrî, Seyîd Riza û Seîdê Kurdî (Nûrsî) û kesayetên din nayên zanîn. Divê ev neheqîya dîrokî bê serrastkirin û cîhên mezelên wan bêne eşkerekirin.

- Divê ew texrîbat û wêrankirinên aborî, civakî, kulturî, dîrokî û ekolojîk yên li Kurdistanê pêk hatine, teva encamên wan ji hilo bêne rakirin; îmkân, derfet û rewşeke guncav ji bo xelkên hatine koçberkirin ku bikaribin vegerin ser cîh û warên xwe, bê pêkanîn; ji bo zarar û zîyanên wan bêne

tezmîn kirin, bi lezgînî programek bê amadekirin û pêkanîn.

- Di serî de di mewzûata perwerdeyê û hiqûqê de, divê dawî li wan têgeh û gotinên nijadperestî, cihêkarî û dêmarîtî yên di edebîyat û lîteratura dewletê de cîh girtine û helwestên di vî warî de, bêne anîn. Helwest, biryar, şêl û tevgerên şexsî û meylên girseyî yên di vî warî de sûc bê dîtî û bêne cezakirin.

- Li Kurdistanê, divê dawî li hûnadina dîwarên sînoran û çêkirina rê û bendavên bi armancên leşkerî bêne anîn.

- Divê sîstema gundparêzîyê (cerdevanîyê) ji holê bê rakirin.

- Divê avakirina bendavên ku xweza û demografiya Kurdistanê xera dike, kevneşopîyên dîrokî di binê ava de dihêlin, zerarê didin tevna ekolojîyê bêne rawestandî.

- Divê dawî li şerê li Kurdistanê tê domandin, operasyonên leşkerî, çalakiyên çekdarî û tundûtûjîyê bêne anîn. Divê pêkanîna van maf û daxwazên gelê me yên acîl û rewa, bi rawestandîna şerî û çalakîyên çekdarî; herweha bi tu rewş, şert û mercên din ve neyên girêdan.



DANEZAN & DEKLERASYON

**PARTÎYA WELATPARÊZÊN KURDISTANÊ
PARTÎYA WELATPARÊZANÊ KURDISTANÎ
KÛRDISTAN YURTSEVERLER PARTISI**

PWK

DEKLERASYON

**PARTIYA WELATPARÊZÊN KURDISTANÊ
PARTÎYA WEKLATPARÊZANÊ KURDISTANÎ
KÛRDISTAN YURTSEVERELER PARTÎSÎ
PWK**

GİRİŞ

2022 yılının Mayıs ayı başlarında Partîya Azadîya Kurdistanê (PAK) ve Tevgera Demokratîk a Kurdistanê (TDK-TEVGER) arasında siyasi ve örgütsel birliğin zeminini oluşturmak amacıyla PAK MYK ve TDK-TEVGER Yönetimi ortak bir Diyalog Komisyonu oluşturdular.

Diyalog Komisyonu, 04.08.2022 tarihinde, belirlenen gündem çerçevesinde ilk görüşmesini gerçekleştirerek, Kuzey Kürdistan'da toplumun en geniş kesimlerini kapsayan milli, demokratik, kitlesel ve legal güçlü yeni bir partiye ihtiyaç olduğu konusunda ortak görüşe vardı.

Diyalog komisyonu birliğin/yeni partinin siyasi program taslağını hazırlama görevini üstlenen her iki örgütün temsilcilerinden oluşan yeni bir komisyon oluşturdu.

PAK ve TDK-TEVGER üyeleri, Diyalog komisyonu tarafından hazırlanan deklerasyon/program taslağı ve birlik sürecinin çerçevesini belirleyen raporlara sundukları görüş, öneri ve eleştirileriyle birlik çalışmalarını desteklediklerini beyan ederek, sürece önemli katkılar sundular.

Mevcut koşullarda Kuzey Kürdistan'da toplumun en geniş kesimlerini kucaklayacak milli, demokratik, kitlesel, legal yeni bir partinin kurulması gerektiğine inanan ve bu doğrultuda önemli çalışmalar yapan PAK ve TDK-TEVGER, konuyla ilgili tüm çevre, kadro ve şahsiyetlerin de bu süreçte yer almaları

temennisiyle, bu konuda somut bazı adımların atılması gerektiğine karar verdiler.

Yapılan çalışmalar sonucunda PAK ve TDK-TEVGER birleşme kararı aldılar.

Kürdistan Özgürlük Partisi (PAK) ve Kürdistan Demokratik Hareketi (TDK-TEVGER), bağımsız şahsiyetlerle birlikte, 9-10 Eylül 2023 tarihinde Diyarbakır'da Birlik Kongresi'ni gerçekleştirerek, 10 Eylül 2023 tarihinde Kürdistan Yurtseverler Partisi (PWK)'ni kurdular.

